# Siyaseta Dij Nijadperestîyê

## Agahdarî ji bo dêûbav û lêneran

Nîjadperestî bandorê li başbûna xwendekaran, beşdarbûna xwendegehê û encamên fêrbûnê dike. Nîjadperestî û reftarên nijadperest li xwendegehên giştî yên NSW nayên pejirandin.

### Siyaset li ser çi ye?

Anti-Racism Policy (Siyaseta Dij Nijadperestiyê) di hawîrdora xwendegehê de rêz û hevsengiyê pêşve dixe. Armanc ewe ku derfetên perwerdehiyê ji bo hemî xwendekaran adil be, bêyî cudabûna d çand, ziman yan paşerehên olî de hebe. Siyaset:

- Bandora nijadperestiyê li ser xelkê Aborijinî çî ye?
- piştrast dike ku xwendwgeh hêviyên bilind ji hemû xwendekaran dike û tu kom ji xwendekaran ji ber paşereha wan ya çandî, olî û zimanî nayê sekinandin ku bigihêjin armanca xwe ya tam.
- ji hemû endamên civaka xwendegehê tê xwestin ku li ser reftarên xwe bifikirin û kiryarên wan negihêjin encama ku kesên din rûbirûyî nijadperestiyê bibin.
- ji hemû karmendan tê xwestin ku perwerdehiyê temam bikin da ku berpirsiyartiyên xwe di pêşîgirtina nijadperestiyê de fêm bikin
- ji her xwendegehekê tê xwestin Karmendekî perwerdekirî Dij -Nijadperestîyê hebe.

### Karmendê Pêwindiya Dij-Nijadperestî çi ye?

Karmendê Pêwindiya Dij-Nijadperestîyê (Anti-Racism Contact Officer (ARCO)) mamosteyek e ku ji hêla midûr ve hatî destnîşan kirin di rêberiya perwerdehiya dij nijadperestîyê de li xwendegehê dibe alîkar. ARCO piştgirîya midûr dike:

- piştgiriya avakirina têgihîştina karmendan ya bandora nijadperestiyê li ser fêrbûna xwendekaran û başbûna xwendekaran
- şîret ji xwendekar û karmendan re li ser dema ku rûdanên nijadperestiyê rû didin yan dibihîsin çawa bersivê bidin
- şîret li ser çi stratejiyên ku xwendegeh dikare ji bo çareserkirina nijadperestiyê pêk bîne.

ARCO hatiye perwerdekirin da ku şîretan li dêûbav û lêneran, û mamoste û xwendekaran li ser pêvajoya çareserkirina complaints (giliyan) li ser nijadperestiyê bike. Ger were xwestin, ARCO dikare di pêvajoya çareserkirina gilîyan de jî wekî support person or advocate (kesê piştgir yan parêzvan) bike.

## Ger zarokê min li xwendegehê rastînijadperestiyê bû ez çi bikim?

Ger zarokê te li xwendegê rastî nijadperestiyê dibe, divê tu teşwîq bikî ku ji mamoste yan ji Karmendê Pêwindiya Dij Nijadperestiyê re bêje, yan jî tu dikarî li ser navê zarokê xwe ragihînî.

## Ez çawa dikarim giliya nijadperestiyê li dij xwendegehê bikim?

Her endamek ji civata xwendegehê, di nav de dêûbav û lêner û karmend û xwendekar, dikarin derbarê nijatperestîyê make a complaint (gilî bikin). Giliyên nijadperestiyê dikarin ji mudûr, Karmendên Pêwindiya Dij Nîjadperestiyê yan ji endamekî karmend re werin rapor kirin. Giliyên nijadperestiyê School Community and Consumer Complaint Procedure wekî di (Pêvajoyên Gilîkirina Civata Xwendegeh û Xerîdaran) de werin bi rêvebirin.

## Nijadperestiya li ser Înternetê çi ye?

Nijadperestiya bi xwendegehê-girêdayî ya li ser înternetê, ku xwendekaran li hember xwendekarekî takane dikin yan jî komên çandî, divê wek li jor hatî gotin ji xwendegehê re bê ragihandin. Ji bo şîreta çawa li ser înternetê ewle bimînî, biçe Online safety (Înternêta ewle) li ser eSafety Commissioner website (eSafety (malperra Komîser).

## Ez dikarim agahîyên zêde ji ku bidest xînim?

Ji bo agahdariyên zêde serî li Anti-racism education (perwerdehiya Dij-Nijatperestîyê).

## Alîkariya wergêr

Ger hewcedarîya we bi wergêr hebe da alîkarîya we bike da bi xwendegehê re bipeyivin yan ji bo çêkirina hevdîtinekê Telephone Xizmeta Wergêriyê bike 131 450 û daxwaza wergêrê bi zimanê xwe bike

Jimara telefona xwendegehê bide operator û operator dê telefone xwendegehê bike û wergêrekî li ser xetê peyda bike da alîkariya we bike.

Ger di hevdîtinên bi xwendegehê re hewcedarî bi wergêr hebe, ji xwendegehê bixwaze ku wergêr organîze bike. Xwendegeh dê wergêrê rû bi rû, yan li ser têlefonê amade bike, li gorî hebûnê. Xizmetên wergêriyê bê pere ne.